WWW.ROJACIWAN.COM

Peşêw amedî têrî helbestê kirin

Tarih: 19.11.2006 Saat: 15:41
Konu: Haberler

Presskurd-(2006-11-19)-Helbestvanê bi nav û deng Abdullah Peşêw bi hezkerênhunerê yên Amedê re hate cem hev û destnîşan kir ku ew bi xwendina hembestên xwe ya ji bo bedenên Amedê pir keyfxweş e.

Nivîskarê helbesta Birakujiyê Abdullah Peşêw bi guhariyek helbesta ya di çarçoveya 4"emîn Rojên Wêjeyê ya Amedê de bi hunerhezên Amedê re hate cem hev, eleqeyek mezin dît. Peşêw gelek helbestên xwe yên wekî Name, Aştî, Sedsal, Rojbaş, Leşkerê Winda ji guhdaran re pêşkêş kir.

Peşêw di navbera helbestên xwe de têkildarî mijarên di helbestên wî de derbas dibe de jî agahî dan û anî ziman ku ew bi xwendina helbestên xwe ya ji bo bedenên Amedê re pir keşfxweş e. Di guhdariya helbestan a hind nameyên Peşêw ên wergerî tirkî hatîn kirin, hatin xwendin de, Şaredarê Bajarê Mezin Osman Baydemîr destegulek da Peşêw.

Piştî guhdariyê Peşêw ji hêla guhdaran ve bi deqeyan li ser piyan bi çepikan hate pêşwazîkirin û piştre Peşêw pirtûkên xwe ji xwendevanên xwe re îmze kir.

Bu haberin geldigi yer: www.sterkaciwan.com
http://www.sterkaciwan.com

Bu haber icin adres:
http://www.sterkaciwan.com/modules.php?name=News&file=article&sid=18654